

Kiryariya Roja Nû: ji bona erdân Sûriye û Libnanê, 35 lreyen Sûr; ji bona welatên din 4 lreyen inglés. Bihayê Hejmarek; 25 Qemerf.

# ROJA NÛ

XWEDI Ú GERİNENDE: MİR Dr. KAMIRAN ALİ BEDIR-XAN

## KOVARA AZADIYÊ

Zehî hejmaraen Kovara Azadiyê gihane destê me; kovara ko zimanê Partiya Kurdi a komîstîr ya Iraqê ye. Bi hejmara Azadiyê a diwemîn de, kovara ko 6 û heta 8 rûpel e, Peymane Miletê Kard hatige çap û belav kîrin. Ev Peyman, pêkaniye zehî bîlind û gedirgiran e û em, bi altîxeşî vê Peymanê têxîn pêş çavên zwendevanen; pêş çapê nijadê Kard.

Heçî pîrsên giran û hêja ko tro ne bitenê kurd lê hemî mîletên Cihanê yêng aşıyîzî bêpendewar û divê Peymanê de, cihê xwe girtine. Jîjîna siyast û komîli, pêşkeftina pasrojîmîndi û iqîsîdî, bervahatina zanîn û hînermîndi û azadperweriyê. Me bi şabûniyeke mezin dîtîgo ko xorîn kurd giranîya pîrsen jorîn bi hîs û eqimîndiyekî kür şîrîne, tê gehîşîne; pîrsen ko helên wan, édi wextekê dirêj ni kare bi şûnda bête hiştin. Ev a Peymane Kurdish a hêja û girane:

## PEYMANA KURDAN

1 — Li ser asasê azadiya her du mîletan, xurt kirina bendên bratiyê di navbera mîletên kurd û erib de. Ji bo vê yekê û ji bo gihana lîna van her du mîletan azadî û bextiyariyê divêt bi hemî eribeben aza, bi ta û civatîn wan û tayê komîstîn Iraqê re bîndîne bratiyê bêne dañûn.

2 — Di riya istiqlala mîletên kurd û erib de xebateke zor divê bête xebîtin da ko Iraq bigehe istiqlala xwe a rastin.

3 — Hikümîteke wêlî divêt bête danîn ko li ser asasên dimokratîye xezmeta mîlet bikiit. Di wê hikümîte de lebaten parlement û meclîsen belediyê ji alyî mîlet ve bi serbesîn divêt bêne hijartîn da ko ew bikarîn mîlet bi rastî binimînîn (temsîl bikin) û bibin nîminendeyen mîlet ên rastin. Herçî qandûn û mersûmîn ko ne miwafîqi destûra Iraqê ne divêt bêne lexiw an tadîl kîrin.

4 — Divêt mîletê kurd bigehe her teixît heqên xwe û cîvâkî û siyasi: danîna civatîn siyasi û - ne siyasi, di riya azâhiya mîletê kurd de, eşkerekirina ray û ramanan, bi serbesîn iktîma û sahînetan, çapkirina her celeb kitêb, kovar û rojnaman bêko ew tabîs miragebatê bêqanûn bibin.

5 — Divêt di menteqeyen kurdan de xebateke iqtisadi û millî bête pâ û di Kurdistanê de, karxane û fabrikê bêne çêkîrin û di wêlî de sînaat here pêş. Ji bo bextiyariyê dîlewemîndî mîlet herçî kar û serwetîn tabîs hene têne xebîtanîn. Awayeç cotkariyê, ji bo zêdekerîna hatina çandinîyê, divêt bête guhartîn û bi awayen nû ên fêne saz kîrin. Erd bi awayen nû, bi awayen wellî têxezîtanîn ko fêda wî rast bi rast digehe lexîk. Herçî rîl û daristan divêt ji destêne hikûmet, sîrket û hin zorkeran bêne xelas kîrin û beren wan divêt rast bi rast bigehe destê xebatkeran. Ji bo hasîlîn kurdan divêt bêne sükîne nû peyda kîrin û ji bo gihanda hasîlî heta wan deran divêt di wêlî de rî û sôseme hêja bêne çêkîrin.

6 — Divêt erdê gundîyan néma bête zemt kîrin û erdîn mirî divêt li wan xelkan bête belav kîrin ko ew bi xwe, bi destê xwe erd tajon. Ji bo pêşkeftina cotkariyê û şenâbiya wêlî erd û eçarîn ko di destê axa û maqûlan de ne, rast bi rast û bê bedel li gundîyan têne leva kîrin. Ji bo arakariya gundîyan û xelksîrîna wan ji talana axa û ribaxwer û emûrav hikûmet ji gundîyan re hin tîstan bi deyn bide (wek halêt û mekinneyen cotkariyê). Ji alyî din ji bo gundi û cotkaran civatîne arikariyê têne saz kîrin da ko gundî di bin selefîn axa û têcîran de neyîne pelâxtin.

7 — Divêt koçer û herçî yêzîpêz bê bedel ji mîrg û çayîrêne wêlî fêdemend bîbin. Ji alyî din ji koçeran re tevdîrîne gerek têne ditin da ko ew ji bîbin gundi û li ser erdekî cih bigrin.

8 — Tevdîrîne gerek divêt bêne ditin da ko ew berberî û xwînrejî, yêng ko ji bo kar û mesleha sîrkarîn çedîbin, ji nav eşîrîn kurdan bête hilanîn. Eşîr û gundîyîn kurdan divêt ji dijminahiye bîgerin û li hev werin. Ji bo vê yekê mehîkemeyen silh û aşıtiyê di nav eşîrîn de têne saz kîrin.

9 — Ji bo parastina heqê karker û xebatkeran nîzam û civatîn têne saz kîrin. Qanûnêke wêlî divêt bête çêkîrin ko di rojîn bêkarî û pîriyê de heq û râhatîya karkeren kurd biparêze.

10 — Eskeriya icbarî di Iraqê de tête xistin fesaleke nû. Tête guhdan xweşî û xwarîna eskerîn û esker bi zimanê xwe û mader têne taşmî kîrin. Cezayîn neîsanîn wek heps û lêdana eskeran divêt bête lexiw kîrin, inzibatîke dimokratî divêt bikeve şuna îsûlîn kevnare û ordû ji mirovîn koneparêz divêt bête paqîj kîrin. Ordû divêt bikeve haleki wêlî ko bikare xizmeta mîlet û bêrenvâya wêlî bike.

11 — Teşkilatîne nû divêt bêne danîn ji bo parastina mesleha xorten kurd. Di nav kurdan de xwendîn bi awaki bog tête belav kîrin û xwendîn û nîvîsîndîna kurdî bi îsûlîn nûjîn divêt bête hêsanî kîrin. Divêt di hemî dibistanîn pêşin, navîn û bilind de hemî ders bi kurdî bêne gotin. Ji xorten xwendîne re yêl ko ji dibistanan derdikevin divêt karine minassîb bêne peyda kîrin.

12 — Divêt nîzamine wêlî bêne danîn ko wêrgû bi awaki adilane li xelkê bête belav kîrin û xelkê kêmkar, bi bin barê wêrgîwê de neyîne pelîxandin. Herçî karkeren adeti û dikandarîn piçûk divêt ji wêrgîwê bêne awartin (is-tîna kîrin).

13 — Igê zad û nanê xelkê divêt bête xistin fesaleke nû û li tevgeren mihtekîn û ribaxweran divê sênc bête danîn. Di igê ticaretî de mixdarê kara têcîran de nîsbedete maqûl de divêt bête bi nav kîrin.

14 — Xebateke zor divêt bête xebîfîn ji bo andîna zarakên kurd, bê ferq, ci keç û ci kur; û ci di merkezîn civakî, qewmî an dîni de. Di min-tîqeyen kurdan de dibistanan sinbet û çokkariyê û xwendegahîn bilind têne vekirin û xwendîna navîn tête fireh kîrin. Ji bo pêşkeftina jîjîna civakî û riyaçî di nav kurdan de cîvat û nadîyin têne danîn. Ji alyî din û ji bo biserxistîna zimanê kurdî civatîn zanîtiyê, kitêbxanê û temâsagash têne danîn.

15 — Herçî hindikahiye ko di Kurdistanê de dijîn, ci qewmî ci dîni, wek tirkman û sreb û aşûri, ézid û cihî, hegen van hindikahiyan û siyasi û ne siyasi, ji alyî ziman û ayînen dîni ve tête venasîn û ew heq bi qanûnêke ve têne parastin.

## LICEZIRE

Nâçeghayê me ji Cezîrê dinivîse.

— Bi himet û xebala Mihafezî me Evidîqâdir Beg Midani, raheti û selamî vegetirîye erdê Cezîrê, eştrîn ko dirêjî hev û di dikirin bi destê wi hatîne lihanîn. Yekîneyen Ordîya Sûrî, bê westabin û bi esq û xezîr parastrîna ushîya erdê Cezîrê pîkanîye. Heta niha ji derdi nezanî û ragesyê, di navbira eşrîn de, zehî tişîren newxwê cedîbîn û bê sebeb peyda dihalin kuştin. Evidîqâdir Beg Midani bi edalet û zêrekîye xwe dermanê vê nesazîye peyda kîrige. Edî heq û qandûn, rasti û edalet dibe sermîyan welet.

— Par, kulyanî xesar gîhandî bûn zevíjen Cezîrê; her send ji berberiga wan hati bû kîrin. Hêj di zehî deran de, hêkîn kulyanî mane û lîrs heya ko sala ko bê, ev bibin disa balaqî serd gundi û colkaran. Hêviya me ji hikûmetî ev û roj berî rojekî bi arkarîya xelkê dest bi qelindîvan van hek û sirfan bike.

Tistîle ko iro sivik, sîbe dikare bîbî tîzîkî zemhet. Heke erdî ko têde hêkîn kulyanî hene halîne colkarin; ev têde dimîrîn û carna, ji malekî du sê peyâ bi vê nesazîye emir didin. Xelkê me diwîz zehî bala xwe bîdin vî tîşîr. Gava mîro, vejk gels dikeve; laşê wî germ dibe, ro pê de dikühe, dîlê wî naçîe xwarîn; xwîn davîye, heya ko bi jana zirav ke, tîşîr; divê hemâ here cem diktoirekt; û bala xwe bîde şîrelîn diktör; jana zirav û xesîxîye xanîmansûz; gelek bala xwe nesazîye xanîmansûz; e; gelek bala xwe bîde şîrelîn diktör; jana zirav û xwe bîdîn!

— M. Misel Xûrî bûye sergerînendeyê xwendegahîn Cezîrê. Em jî re dibîjîn tu bi xer hatt. Erdê Cezîrê hewcedarî û ramana hîlî xwe dibînîm; di vajî ronahiye de, cip û rast, dilresî û xîşkîkîrî neyaran dibînî!

Rojnama delal, beyîna te, zendebüna me ye; û tenebüna te neyîna me ye; û ev ji, bi awakî rast ji terîpêlîn bijîşkan hatîne nas kîrin. Heke ji ronahlî û tirêjîn rojê û germiya wê ne be; bi em ji arkarê te ne.

— Di medreyen Amîdî û Safî-i de, dersa tecvîdî, bi zimanê kurdî têle xwendîn û fejê je zehî istifade dîkin: yîn ko ev kar baş pêk antîne li dinya û axirelî berzurdar bîbin.

— Di erdê Xabîrî de, xestexaneke ingîlîze heye. Heta niha vê xestexaneke zehî arkarîya sefir û belengazan kîrige. Her heste bi otomobilek dîktor di nav xelkê de dîgerin, li nesaza dinîrîn û dermanî dîdin; wan; bîhâyê nîrîta nesazekî pênelî girayen surîye; ango ne heqê banzînî ye; û gava nesazîye yekî giran e, wi dîbin xestexaneke xwe û lê miqate dibin; heqê xestexaneke pan-de û heta bîst lîşîyên surî ye; disa zehî erzân e. Em spasîn xwe pêkesî dîktor û karîkeren û xestexaneke dîkin; ev tîşîr jî bona xelkê Cezîrê mihrîbîneke hejî ye.

— Ebîlî Beg Alîse, serekî şerdarîya Sâriyegî, hatîye Cezîrê û Derbasyî. Em jî re xwesîhî dibîjîn.

— Der nîzingî Derbasyegî, li hêla gundi Çetel pîrîkî bag hatîye çêkîrin.

— Di jîyîna civakî de divêt bête goh-dan jîyîna mat û eyletê. Jin, herweki û xwendîn gîhafî û bi servetî de ye, divêt bête gîhandîn rîya mîrîan û jî mîrî; di hemî heqîn xwe de bibin wekhev.

— Di warê azadiya mîletê kurd û pêşveçîna wî a civakî de divêt hevîkîyekî de navbera hemî welatîn kurdan de bête danîn û kurd û di vi watî de; pev re hidîn û bîstînîn.

— Ev e, peymana welatî kurdan ya koji me re divêt em wê bibin seri.

Eve, peymana me, peymana ko dixwaze mîletê kurd bigehe serbesti, bextiyariyê û pêşveçînû. Em deng li hemî kurdan dikin ko bi me re, ji cihanîna wê re bexebetin.

## Diyarı

Roja Nû tu gelek bi xêr û bêr, û pêpar û siûd û bextiyari, bi ser çavê min re hafî. Te bi ciwanî û çelengî du nav li xwe kirin.

Tu bi navê «Roja Nû» derkettî û di demek hindik de, te xwe ji me nepenf kir, da ko disa ji nişkave li me derkevî û em ji bêjîn:

— Wey maşa-elâh «Roja Nû» va ye, ji nû ve hilat. Du caran navê nuh, ji te re bû gotin û paya te bîlîntir bibe; ya sisîyan da ko tirêjîn xwe bavêjî lat û zinarêne welatî aza û seza; hingî navê nuh û yekcari ye, û tu caran kevin na be.

Belê, berî ko tu keti kusûfî, min dîdevanyîfe feleki li pêriya te dînebêrî û digot: wey; bextê reş dibûm; qedera roja me ji wek me ye, çîma ko timî em giriftar in; ew ji dike wekî me, ji xwe re, dîrokek dîlbîrîn peyda bike; ji ber ko wê ji bîhistîye û tengasiyan ji ni zane; û na be pispor, xav dimine; û mexab in; navê xav kêmâni ye. Yê qenc kemasîyan ji xwe û dûr davêje, le qenciyê wek neynîke dide ber çavê xwe û pê dilgeş dibe.

Roja Nû, ez di ronahiye te de hêlinâa dilê xorten welatî, û tirbên şefkîn welet û di hindurê şefkîn tarî de, armanca reh û ramana gel xwe dibînîm; di vajî ronahiye de, cip û rast, dilresî û xîşkîkîrî neyaran dibînî.

Rojnama delal, beyîna te, zendebüna me ye; û tenebüna te neyîna me ye; û ev ji, bi awakî rast ji terîpêlîn bijîşkan hatîne nas kîrin. Heke ji ronahlî û tirêjîn rojê û germiya wê ne be; bi jîn na infîne.

Ji xwe tirêjîn rojê ji bijîşkan bêtîr û çetîr, migrobîn erdê dikuje.

Dema tu hati bû girtin, nexwesi û jariyê, weke mijê girti bû ser me. Spas ji yezdan re, niho xwîna me vegeriya û bîhna me firek bû, û nefsa me a şefqî dayî; pê zeffîre xazê; ji ser dil û kuvanî me paqîj dike.

Her biji Roja Nû, xuda emrî te direj bike tevîs hevalen te, ên dûrî hev. Sipas ji jîyîn ji pêkinê te û dilovan û navdar re.

Amûde: H. Hisyar

daxwaza me eve o hejmîr wan her û her bêtîr bîbin.

Ta, dizanterî, jana zirav, nesazîye zaroyan zehî xesar digîhîne xelkîn Lezîr; em jî mihafezî xwe û sehrezâ hêvî dîktor û bi tîşîr jî mijîl û jî qe ne ve, di bajaran de, mîra Derbasyî, Serî Kaniyê, Turba Spi, Eynî-Dîvar dispanser bêna vekevîn. Em dizanîn ko ev lişek hêsanî ye, le disa em dizanîn ko himet mihafezî me zehî mezin'e.

=====

16 — Di jîyîna civakî de divêt bête goh-dan jîyîna mat û eyletê. Jin, herweki û xwendîn gîhafî û bi servetî de ye, divêt bête gîhandîn rîya mîrîan û jî mîrî; di hemî heqîn xwe de bibin wekhev.

17 — Di warê azadiya mîletê kurd û pêşveçîna wî a civakî de divêt hevîkîyekî de navbera hemî welatîn kurdan de bête danîn û kurd û di vi watî de; pev re hidîn û bîstînîn.

Ev e, peymana welatî kurdan ya koji me re divêt em wê bibin seri.

Eve, peymana me, peymana ko dixwaze mîletê kurd bigehe serbesti, bextiyariyê û pêşveçînû. Em deng li hemî kurdan dikin ko bi me re, ji cihanîna wê re bexebetin.

# Tefsîra Qurané

129- Heke hon ji hev vediqetin, Xuda dikare ji kerema xwe bi dewlemendiya xwe arikariya we bike, Zanîna Xuda dora her tiqt digire. Xuda férîs e.

130- Her tıqtîn erd û ezmanan milkê Xuda ne; me li yén ko beriya we kitêb hate dayin' û li we şret kırin, ta ko hon ji Xudayê xwe tırsiyar bibin; heke hon kafir dibin bizarın ko xudanê erd û ezmanan Xuda ye û Xuda dewlemend e, şayesteyî medî û sena ye.

131- Her tıqtîn erd û ezmanan milkê Xuda ye û sermiyaniya Xuda besi her kesi ye.

132- Gelf mirovino... her ci wextê ko Xuda dixwaze we dirîfne û hinîn din datfine cihê we; Xuda bi vi tişf dikare.

133- Her kesê ko sewaba dinyayê dixwaze, bila bizane ko li cem Xuda, sewaba dinya û axiretê heye, Xuda bina û bishîtiyâr e, dibine û dibihiye.

134- Gelf bawermendino... gava hon şehdetiyê didin, Xuda binin bîra xwe û li gora rastî û edaletê şehdetiya xwe bidin, ev şehdetî zidî we de, an zidê dê û bay û mirovîn di we de an zidê mirovîn xuri û dewlemend de be ji, tu cara dest ji rastiyê bermedin û seba belengazi an xurîf û dewlemendiya mirovan şehdetiya xwe vemeşerîn û rastiyê me guhîrin û derewa bi alf xelkê ve me din, ji bir me kin, ko Xuda ji we re ji her kesi nîziktir e; tabîtî nefsa xwe û erh û hejkirina xwe me bin, ji rastiyê vemeşerîn. Heke hon Xuda me ke, rastiyê diguhîrin, derewa dikan û emrê Xuda davêjin pişt guhî xwe, bizarın ko Xuda emelê we dibine û qesda we dizane.

135- Gelf bawermendino... baweriya xwe bi Xuda û bi pêxemberen di wi û bi kitêbén ko beriya wi hatine dahatîn binin, yê ko Xuda û melyaket, kitêb û pêxemberen di wi û roja piştawiyê inkar dike, divê bizane ko ew ji rastiyê yekcar dûr kitiye û riya xwe şaq û winda kire.

136- Yen ko baweriya xwe anîne û pişte kafir bûne, paşî ji nû ve baweriya xwe anîne, paşî bişînda vejeriyane û disa kafir bûne û di pist re kufrê xwe bêtir kirie, bila bizarın; Xuda gunehêwan gunehkaran efiw na ke û wan na gihîne riya rastiyê.

137- Ji minafiqan re elam bide, ji bona wan ezabekî dijwar heye.

138- Ma yen ko desten xwe ji hevalstiya misilmanan dikigîniñ û ji xwe re kafiran dikan heval, cawan serifiraziye kî dixwazin? Ew bila bizarın ko serbilindi û serifirazi bi temamî milkê Xudaye,

139- Me ji we re bi Qurané; da zanfn, ko ew kafir ayetén Xuda dibihişin, le baweriya xwe bi Qurané na yénin û heneke xwe bi ayetén Xuda dikan, ji ber ve yekî li ba wan rûmenin, meger

ko ew gotina xwe diguhîrin û li ser tiştefî din dipeyivin; heke we wisa ne kir; bizarın ko hon ji mina wan dibin. Xuda hemî kafiran di dojehê de wê bicivine.

140- Ew çavnîriya we dikan û gava hon ji kerema Xwedê serdest dibin, ji we re dibêjin: Ma em ne bi we re bûn? û heke kafir, ji serdestiyê behrdar dibin, dibêjine wan: Ma me arikariya we kir, ma ma hon ji bawermendan ne parast? Xuda di nav beyna we de, di roja piştawiyê de, hikma xwe wê bide. Xuda bernalde ko zidê misilmanan firsetekî biveke destê kafiran.

141- Mirovén riyakar dixwazin Xuda bixapinîn, le Xuda wan dixapîne, heke ew radibin nimêjî ji, le guh nadiné; qesda wan ew e ko xell wan bîbinin û ew navé Xuda kêm tînin bîra xwe.

142- Di nav beyna her du riyan de bê ser û bin dudiliye dikan, ew ne ji van û ne ji ji wan in; ji bona mirovekî ko Xuda ji riya xwe kiriye, tu ni karf reke peda biki.

143- Dest ji hevalstiya misilmanan me kişnîn' û ji xwe re kafiran me kin heval; ma hon dixwazin ko Xwedê ayetén xwe sanî we bide û we bitirşine.

144- Mirovén derewin û riyakar qata dojehê a jérin de ne, û ji bo wan tu ni karf arkarekî peyda biki.

145- Bi tenê yén ko tobedar dibin, xwe dinasîn û xwe davîjîn bextê Xuda û baweriya xwe bi Xuda tînin, ew bi mirovén bawermend re ne. Xuda ji mirovén bawermend re bi ci awayekî delal sewabê dide.

146- Heke hon baweriya xwe tînin û sikîrdar dibin, ma cima Xuda we biezibîne? Xuda qedre sikîrdaran digire, Xuda zana ye.

147- Xuda ji bihistina tiştîn kirêt, weke dijûn û bêdiyaf hez na ke, meger ko tiştîn wiha ji devê mirovekî ko jê re zilm hate kîrin derkeve; Xuda bihishtîr û zana ye.

148- Qenciyâ ko hon dikan veserîn an aşıkare bikin; û heke hon di suçen yekfî dîborîn û wê vedişerîn, bizarın ko Xuda xwe-diyê qudret e û pê dîzane; û Xuda di gunehan dîbore.

149- Yen ko Xuda û pêxemberen di wi inkar dikan û dixwazin li gora eglê xwe di nav beyna Xuda û pêxemberen di wi ferqekê bexin û dibîjin em baweriya xwe bi hin pêxemberen Xuda tînin û hinîn din inkar dikan û dil dikan ji xwe re di nav bera kufr û baweriye de rîke peyda bikin, ekgere ye ko;

150- Ew ji dil kafir in, me ji bona wan ezabekî dijwar pêk anîye.

151- Emî bi ci awakî delal se-waba mirovan bidin ko baweriya xwe bi Xuda û pêxemberen di wi anîne û tu ferq na éxin di nav beyna pêxemberen Xuda de. Xuda gunehan efiw dike, Xuda dilnem e.

152- Pêxemberê min... Mirovén xudankitêb ji te wê bixwazin ko tu ji wan re kitêbekê bidîf dahan; ew berê ji tiştefî jê hêj mezinir xwestin û ji pêxemberen xwe re gotin: ka ji me re Xuda aqikare bide dîtin; birûskê seba vê xedariye ronahiya çavén wan bir; pişte rabûn, herçend ji ji wan re ayet û dellî hatî bû dahan, ji xwe re golikek anîn û jê re perestî kîrin; me disa di gunehêwan borî, lê ji Mûsa re me edî emrê kuştina wad da, tako ew tobedar dibin.

153- Gava wan ji me re sunda bindestiyê xwar (gava me ebde wan bir) me di ser serê wan re çiyâyê Turê da sekinandin û me ji wan re got: Ji dergehê Erfayê li ser çokêk xwe derbaz dibin û di roja semê de dest ji masfanîye bikişin; wan got: me emrê Xuda bîhist û eme li gora emrê Xuda bimeşin.

154- Lî her wekî ew ji gotina xwe bi sunda vejerîyan, gotina xwe şkenandin, ayetén Xuda inkar kîrin û bê ré pêxemberen Xuda kuştin û gotin: dile me kalkankîr ne, gotinên te li me têşîr na kin; tiştîn giran me anî serê wan. Xuda seba kufre wan dile wan mor kiriye û ji wan hindika baweriya xwe anîne.

155- Her wekî wan dijûn li Isa dan û gunehêkê mezin xistin stoyê Meryemê, bi emrê Xuda dile wan hate girtin û ji kerema Xuda bê behr mane.

156- Gotina wan: me pêxemberê Xuda Mesih îsa kurê Meryemê kuştîye ne rast bû; wan ew ne kuşt; û bi dar ve ne kir, le wan mirovekî ko dixwest îsa bikuje û dişuhubî îsa, girt û kuşt û bi dar ve kir, yê ko bi mezinahîye îsa qail ne bûbûn bi hev ketin, tu xeberen eseh li cem wan nîn bû; wan ji xwe re zen dikir û dişuhubî îsa hate kuştin.

157- Rastî ev e ko îsa ne hate kuştin, le Xuda ew ji nav wan bal ezmanan ve hilant; Xuda delal û férîs e.

158- Hemî mirovén xudankitêb berfî mirîna xwe baweriya xwe bi îsa we bînîn û ew dé qebûl bikin ko îsa evdî pêxemberen Xuda ye; le herwekî xudankitêb vê rastiyê, di dema tengiyê de; û bi ve ne ve, vê rastiyê qebûl bikin, îsa di roja piştawiyê de, di heqê wan de; şehdetiyê wê bide.

159- Herwekî cuhiyan gunehine giran kîrine, ji riya rastiyê vejerîyan û xelkê ji, ji wê ré dan vejerandin, tiştîn spehî ko ji wan re helal bûbûn, me ew tiştî ji wan re heram kir.

160- Her çend ji, me ji wan re heram kîri bû; wan disa faiz stand û malê xelkê bê re û heq xwarin; ji ber ve yekî me ji bo wan kafiran ezabekî dijwar pêk anîye.

161- Lî yén ji wan ko zana, dilpak û bawermend in û baweriya xwe bi Quranâ ko ji te re û bi kitêbén ko beriya te hatine dahatîn anîne û nimêjâ xwe dikan, zekâtë didin û disa baweriya xwe bi Xwedê û bi roja piştawiyê anîne bila bizarın: Emî ji wan re sewabeke mezin bidin.

162- Me ji te re wehî da dahan, herwekî me ji Nûh re û ji pêxemberen pişti di wi re ji û me Ibrahim, İsmail, Isheg, Yaqûb û çeliyân di wi û îsa, Eyûb, Yûnis, Harûn û Sîleman re ji wehî da dahatîn û me Zebûr da Dâwid.

163- Me ji te re, berfî qala hin pêxember kîrin û qala hinan ji ne kîrin û Xuda ji kerema xwe bi Mûsa peyivi.

164- Me pêxemberê xwe şand da ko ew ji qendkeran re mîzgîniya buhuşte bidin û gunehkaran bi ezabî dojehê bitirşin û riya rastiyê pêk xelkê bikin; me ne dixwest ko xelk di roja piştawiyê de rabîn û bêjîn; tu kesi riya rastiyê şanî me ne da, heke me riya xwe şaq kiriye em di vê debî súc in; Xuda delal û férîs e.

165- Wan pêxemberîtiya te inkar kîrin û kafir bûn; le Xuda bi Quranâ ko ji te re da dahatîn şehdetiye pêxemberîtiya te dide, mîyaket ji şehdetiye didin û sermiyaniya Xwedê besi te ye.

166- Yen ko kafir bûne û xelkê ji riya Xuda derêxistîne yekcar ji rastiyê dûr ketine.

167- Yen ko kafir bûne û zilm û tada li xelkê kîrine, Xuda di gunehêwan na bore û wan na gihsîne riya rastiyê.

168- Riya wan riya dojehê ye, ew wê bigehîn dojehê û têde her bimînnîn. Avetina wan dojehê ji Xuda re ne tu zehmet e.

169- Gelf mirovino... Xuda bi ayetén rast û qîmetgiran ji were pêxemberê xwe şandiye, heke we pê baweriya xwe anîne digehîn xeyr û qenciyê, heke hon kafir dibin bizarın ko Xuda xudanê milkê erd û ezmanan e, û Xuda zana û férîs e.

170- Geli xudankitêbino... silnorîn dinê xwe derbaz ne bin, hikmânî wi tev li hev me kin û di heqê Xuda de rastiyê bêjîn, weke cuhiyan ji îsa re plê e û mina filan jê re kurê Xuda ye me bêjîn; ji ber ko Meshî îsa kurê Meryemê, pêxemberê Xuda ye, ew bi emrê Xuda ketîye zike diya xwe û rûheki ji Xuda ye. Geli fileyino... baweriya xwe bi Xuda û pêxemberen wi bîlin û me bêjîn sisé ye, me bêjîn Xuda bû sé perçe û sé perçe digehîn hev û dibin Xuda. Destê xwe ji ve gotinê bikişinji ji we re cétir e; Xuda Xuda ye, ji her tişf bilintir e û yek e, bê hempa û hevber e, tu kes ne kurê Xuda ye, tiştef welli na be, mezinahîye wi ji tiştef wiha dûr e, her tiştef erd û ezmanan milkê wi ne, sermiyaniya Xuda besi her kesi.

171- Meshî îsa nefsmeziniyê na ke û ji evdîtiya Xuda xwe na de pag; yén ko nefsmeziniyê dîkin û dest ji ibadeta Xuda dikişinîn divê bizarın ko Xuda wan di roja piştawiyê de; wê li hev bicivine û bişîne.

172- Lî yén ko baweriya xwe anîne û qencî kîrine, Xuda ji kerema xwe sewabeke wan bêtir dike, le belê yén ko nefsmezînî kîrin û xwe ji ibadeta Xuda dane pag, xwedê wan bi ezabekî dijwar dişine û ew dé bîlinin ko ji xuda pê ve tu sermiyaniya û arkar nine.

ne qediya ye

## Hakim û sê keçik

Ferzende çavé xwe girt, kalo destê xwe li pişta wina xist; çavé xwe vekir, nêri ko di bajarê xerabê de ye. Miqabil xwe nerf, hesp bê xwedî. Çû ser dîwrê, mîna kalo jê re got kir à hespê xwe anî; hate mala xwe.

Keçka wezir nerf ko lawik hesp anî; à keçka wezir dixwaze wi bigine bi rêtê de ko ne yê..

Careke din hat be wina, jê re got: hespê te pîroz be, tişki dî ji te kêm maye! Ferzende jê rego: ci ye! Go: tu bê jin i, heger tu Bilbilhezar ji xwe re bînî, we gavé t'ê kêt biki.

Ferzende jê re got: Bilbilhezar ci ye?

—Wê jê re got: qizek e, Bilbilhezar... Ferzende go: lazim e, ez wê ji bînîm. Ferzende li hespê xwe siwar bû, à hespê wina, mîna bê difire; bi çolê de çû, careki nêri ko kalo sekiniye, giha cem kalo, xeyirhatin tê da; kalo jê re got: tu herf kû?

Go—ezê herime Bilbilhezar! Kalo jê re got: gelek, siwarêd wek te, bûne kevir û ne gihane wê, ew hikmê cina ye, tu bi ya mi dikl, tu'ê vegevî.

Ferzende go: kalo, oxira ko ez pê de derim, ez tu car venagerim! Kalo, nêri ko çare tê na be; go: lawo tu niha herf qonaxa du roja, t'ê bigehî, sirtek bilind, t'ê binerî hemî siwar in, bûne kevir; t'ê di wan siwaran de bîbihor, kehnîk di pêtiya te de heye, t'ê peya bibî, li ser vê kehniya avê; nanê xwe derxî û li ber xwe deynî, rovîl heye, yeki ko guri ye, wê bê cem te, t'ê je re bê; kerem bike bi min re bi-xwe; rovî wê ji te bîbêje: ez guri me, çawan ez bi te re bixwim, tu bêjê xem na ke, tu ji min çetirî, wê ev rovî bibe zilam, wê te bigihîne miradê te...

Hege rîgo: te wilo ne kîr, wê te ji, mîna wan siwara bike kevir. Ferzende bi ya kalo kir, giha wan siwara, rovî dî, qedrê rovî girt û rovî jê re got: siûda te baq e, à ezê te bigehînmî miradê te.

Rovî jê re got: tu hatiye ci? Ferzende go: ea hatime Bilbilhezar. Rovî go: baq e; ev qesra hana tu dibînî, t'ê herf ber dere qesrê, gérêk di vî alf derf heye à qantirek li aliye din heye; got li ber qantire danîne û giha li ber sér danîne, t'ê giha bavêjî ber qantire û goşî deynî ber sér, ewê bi xwarina xwe dakevin, wê rî bidînt, tu herf hinduro.. Çel ebîd hene li pişt deriyê qesrê de razayî ne, her gel ebîdan bikuji, qizek li ser textê xwe de raza ye Bilbilhezar, raheje wê li ser hespê xwe deyne û here.

Weke rovî jê re xeber da, bi ya wina kir û Bilbilhezar anî mala xwe.

Pir këfa wina û xweha wi bi Bilbilhezar re hat. Bilbilhezar ji Ferzende re got: lazimtu dara min bînî vê derê. Konaxa sê roja tu ê herf, t'ê di welatê Tar û Barê keví, wê li te bibe geva reş, t'ê de, di nav dora keví, qaçkî jê bişkîne û bîne.

Ferzende çû qaçkî ji vê dare anî, li hewşê de çikandin, sibê he

## Fepir Eli

Eli Zilameki fepir û belengaz bû, di gundê xwe de, ji xwe re got: ezê rabim herim bajarekî, heye ko Xwedê Teala ji mi re sebebî derxîne.

Kerwan karê xwe kirin, wê herin Helebê, ew ji bi wan re çu.

Çend rojkê meşîyan, gihane Helebê. Feqîr Eli kesf nas na keji xwe re parsê dikê. Rojekê rastî xortekî hat û parsa xwe jê kir. Xort lê nerf go: ya feqîre delal, ezê ci bidime te, ez pîr bidim te, pênc qırûş, wê ji te ci bikin pênc qırûş Here bajare Stenbulê, Siltan tu ci bixwazi we bide te!

Feqîr jê re got: ya xortê delal, ez li kû, Stenbul li kû, heqê nanekî bi mi re tu ne, ez feqîr, belengaz, ezê çawan herim Stenbulê?!

Ez xort jê re mecidîk da, got: her ji xwe re nîv mecidî nan bikire û édin ji xwe re cotek çarûx bikire, têxe lingê xwe, bi kerwana re here, xwedê debara te bide, heya tu bigehî Stenbolê...

Feqîr mecidîy xwe jê stand, debara xwe pê kir û bi kerwana meşîyan.. berê xwe da Stenbolê.. Ew bi riya xwe de çû, xâkala me çû ser Siltan. Siltan heroj pêncsed feqîr bi xwarin dike û bi kiswet dike.

Heroj ko tê mal, ji kuflâtê xwe re dibêje: kif wek min heye ko feqîra xwedî dike? Hemî dibêjin, kesek weke te tune ye, qizek wina heye, jê re dibêjî yabo, yek heye, é ko feqîra xwedî dike, deqîqakê; tu heta tu sax bi, nikarî weke wi biki.

### ne qediyyate

nêrîn ko ev dar bi ser qesrê ke, tiye, ciqas fêkiyâ dînyayê hene, di vê darê de çedîbin. Bilbilhezar ji Ferzende û Gulçelkî re got: ev bajar ê bavê we ye, û diya we niho di eyarê gamêşde, li ser cadê dâline, heç dire û tê tîskê didiyê. Tu rabe here, qehwa ko bavê te lê rûnigitiye, à jê re bêje: ya hakimê delal, lêv tu li cem me mîvanî ye, Ferzende çû, qehwa ko bavê wi lê ye û jê re got: lêv tu meyvanî me yi.

Hakim lê nêri ko ci xortê delal, esqa hêkim qû ser wi xortî û jê re got: baq e, ezê bêm.

Ferzende vegeviya hate mal, û ji Bilbilhezar re got: bavê mi wê bê vê derê; karê wina kirin, xwarinak minasib jê re çekirin; û évare, Ferzende çû hakim anî mala xwe.

Piştî ko şîva xwe xwarin, Bilbilhezar ji hakim re got: ji me re çrokekê bêje. Hakim go: ez nîzanim, kerem ke tu ji me re bêje!

Bilbilhezar qiseta wina û zaroyen wina, û her keçikan jê re got. Ji nû ve hakim nas kir ko zaroyen wina de; këfa wîgelekî bi wan re hat, û jîna xwe jî cerêm gamêşî derxîst û ew û zaroyed wi li ba hev anîn û her du jînên xwe û din kuştin.

**Sere Kurdistanê sax...**

# MIRÉKA CIHANÉ



Ji bergehîn axa germanistanê; Berxesgaden; qesra Hitler lê bû; lê Hitler, zâlim û zorkerek bû; bayê azahiyê ew xeniqand û qesra wi hil weşand.

## Hinermandî-Zêreklyâ Xebat



Ax û kevîr, dar û sêlaq bi xebat û zanînê, dibin bîc û qesrî, mal û xanî, xwendegah û xestexane; heşin bi xebatê dibî pola; mekîne, çek û sileh, otomobil û balafrî; herf bi xebat dibî serbîk û den; û hezar tîşen din. Heçî ji welatê xwe hez dîkin, dixebeitin; û mirovén ko dixebeitin serfiraz dibin; dîjmînê wan yek be hezar be; ne in xem e.

## Kebata Kurdêne Iranê

Rojnameyên Tehranê «Eres» û «It-tilaat» batine gerfinendekariya Roja Nû. Ev rojnaman zehf qala Kurdistanâne Iranê dîkin û me tê de bangna ko civata Istiglala Kurdistanê çap û belav kiriye xwendiyeye. Di vê bangne de, xorxen kurd dibêjin deh milyon kurd hene, û Kurdistan 500.000 kilometir çargueye; mina miletên din; milete Kurd ji Istiglala xwe dixwaze. Bangin herweki rojnameyên Tehranê didin zanfu bi zimanê kurdi, rûsi, ingiliz, erbi, farist, û tirkî hatye nivisandin û çap kirin.

Rojaameke Tehranê bi pîrsa Kurdistanê mijûl dibe û dinivise: fikra istiglala Kurdistanê mina nesaxiya giran weba û taûn, ji Kurdistanâne Iraqê ketiye Kurdistanâne Iranê.

## Hawila Mir Kamiran

Eya Diktor Kamiran, her dem ji te me sipas  
Ev riya rast û bedew, ji me re dani te esas.  
Ji dil û can tu rabû, bi mîletê me kur-dan  
Erdeh hişk û tehtebêz, bi destê xwe te wer da  
Pigî te mer xilax kir, sîlit jê re te dani.  
Kantî ji çol û çigan, bi cokan te anî ser  
Te em danîne sagîrî, ji ber tevir, das û mer  
Îro ko eua dinêrin li wê erdê bi şefel  
Tev şin dike her sîlit, du sê pel û bi çigar pel.  
Nemaze mîletê kurd rojek dê pê biarın  
Îro ne bû di roj di, wê jê her bû te xwarin  
Giga tu car nomine, di bin kevir te girtî;  
Weki Tirêj dibêje: xismê dîle minsuhî.  
Amûde: Tirêj

## DIGEL YARÊ

Lî min kin şiretê dîlxwaz ni zanim dê gi kin iro,  
Ji, egeqê dîl diki perwaz, ji bar nale me can iro  
Mendal- her dem û carê û nazik rû ne da min qel  
Me dîl bâ pête û arê ji egeqâ gewheran iro.  
Xuya lê dax, bi hejmar sed, nezanî bû geman vê ez  
Bijîskê sed wekti Luqman, digel Hendas à Calnos  
Meger bi min ji her derman, nikar li çare bin iro  
Dibîtin her li dildaran, tebat bin ew li ber xisman  
Bi kincê teng û qerpalan, girifstar bûn hemme iro,  
Di pê xismê ditovan e, xebat genc e, he-sê dildar  
Te e-cul karê şeytan e; bikin sebr û te-bat iro.  
Hegi tirêj kir û westî, se û wi hej li hu-waki  
Ji müşê şerbetek xwestî, bi kasa Cem vexwar iro.

Amûde: Tirêj

## Kitêbêni Dawîn

Yen ko qala pîrsa Kurdistanê dîkin

Di vê dawîgê de, li ser pîrsa Kurdistanê, sê kitêb hatine çap kirin, û her sê ji bi zimanê erbi hatine nivisandin, û li Bérûtê ketîne firotîne.

Nawê van kitêban û nivisavanê di van:

— El - Ekrad - si - Libnan û Sûriye. Bi gelema Dr. Edib Mihemed. Bihayê wê sed qirîşen libnani.

— Kurdistan - ew - Bilad - el - Ekrad. Bi gelema Seyda Yusîf Malik, xwe-dîpî rojnameya Esa. Bérût: Sendiq - el - Berid: 857. Bihayê wê sed qirîşen libnani.

— Qediget - el - Kurdish, beyin - el - ems - we - l - yewim. Bi gelema Dr. Mihemed. Bihayê wê sed qirîşen libnani. Adreşa Dr. Mihemed: Millîk Debis: Terîq - Ebîl - basit - el - Faxûr; Bérût; Libnani.

## Biserxwebûna Kurdistanê

Tebran- A.F.P. Di Kurdistanâne Iranê de, zehf texelan qedibin; xelk istiglala Kurdistanê dixwazin; heyeteke giran, ji heft nimî. mendeyan bîhevkeş çune Bakoyê û serekê Kurdan, jê ji xwe hilaniya û berê xwe daye Moskovayê. Ev in lebaten Civata Istiglala Kndistanê: Mirza Qadi Mihemed, Ixanî Zade, Mihemed Huseyin Seyif Qadi, Eli Rihanî, Hemze Aqa Mameş, Evdilah Beser Haci, Hemze Celdiyan.

## XWENDEGAH

Ey Mizgino bixwîne, van îlicîken li jori  
Bo te nezan ne mîne, piçûko dê bi gorî  
Hemî sal sê sed û qest, digel pênc roj bi hejmar  
Sev ji rojan te hesêb, bi saetan bist û çar.  
Ji heft rojan û heştan, di nav bera wan in e.  
Sal dîbitin diwanzde meh, û rojén wan sîne.  
Pêşber, kanûna paşîn; sibat û adar li dû  
A neb'meha ilon e, çiriya pêşin deh e,  
Yanzde çiriya paşîn, kanûna li pê diwanzdeh e.  
Sal hatîye par kirin; çar dem jê hatine der  
Her nav bera sê mehan, tê heye wextek û ger.  
Biharê erd heşîn e, havîn tevayî germ e;  
Payizé pelweşîn e, zivistan xir û serme.

Amûde: Tirêj

Mirza Naîf Heso, ji gundê Girheftar, xortekî hejde salf ye; ji kerema xwe û bi destê Seydayê delal Hesen Higyarê şîhir ji me re şiyandine. Em bi dîlxwîşî nivisarêni di wî çap û belav dîkin. Bi xeyret û xebat, Mirza Naîf Heso, wextekî nizing de, beşik dê bibe nivisavanekî xurtir û bilintir.

## ÇAPA KURDI

Nitho bi zimanê kurdî hevde kovar û rojnameyê derdikevin. Jî van pê ve, li Bérûtê, her panzde roj carekê, bi zimanê frensîzi rojnameyek derdikeve; navêwê «Le jour Nouveau» ye; car râpelên di wê en merzin hene. Ev rojnameyê gala cand û nîvîsar û sigaseta Kurdistanê dîke û doc û dehuwa mîletê Kurd, têrê şpeşavên cihanê. Ev in navên kovar û rojnameyê u welatên ko tê de têne çap kirin. Li Songestanê: Ruya Taze, Kova ra Qeqfase.

Li Iranê: Pegam; Nîstîman, Kühistan, Zegros. Ciya, Tîrâske, Yekîtiya Têguşin. Li Iraqê: Azadi, Jîyan, Gelawej, Dengî - Kîlîyi - Taze.

Li Şamê: Hawar, Ronahi.

Li Bérûtê: Sîr, Roja Nû.

## Cigareyên Tamdar

Cigareyên çetir û tamdar, yêng Rejiya Libnan û Sûriye ne. Jockey-Klub, Yekemîn, Befra, Tatli-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiak; ev cigareyên he hemî, ji titinê çetir û paqtir têne çekîrin. Pişî xwarîne cigareke baş, dile cigervexwaran vedike.

Gava dixwazin cigareke ve-xwin, navêن Jokey-Klub, Yekemîn-Birinci, Befra, Tatli-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiak bîmîn ji ra xwe û yek ji wan paketan, bîxwe re bibijerîn.

# MIRÊKA CIHANÈ



Hin bi şefqe û rob in; bin bi küff û xeftan in; hin porzer û çavşin in; bin çavres û semerten in; bin kinik in; bin bi bejn û bal in; lê hemî jin in; zirav û nermin in; dermanê dilan in; xamrevina dilî xortan in.



Avahiyê Seygonê ecêb spehî ne; wêneya jorîn avahiyeye spehî ji ya vi şaristanî pêş me dike.

## SEROJNAMEYÊN DIN

Herweki rojnameyên Iranê didi zanîn, di Kurdistanâne Iranê de, sê rojnameyên Nû û kurdi derdikevin. Navêrojnaman ev in: Ciya, Tîrâske; Yekîtiya Têguşin. Roja Nû, ji van rojnaman re xebateke çak û jiyyîke direj dixwaze. Iro, nîzîkahî ve bîst kovar û rojnameyên kurdi bene.

## RADYO

Weşnekên heroje bi zimanê kurdi:

### Li Bérûtê:

Radyo Bérûtê; hero pişî nîro, li saet pênc û sih deqîqan de, li ser pîlén kurt û navîn bi zimanê kurdi nûçeyen Cihanê û dawîn belav dike. Dirêjahiya pîlén: kurt 37 métir û 34 semîmetir, an 8.036 kilo sîkil; pîlén navîn 411 métir, an 730 kilo sîkil.

### Li Bexdayê:

Hero pişî nîro di saet çaran de, destpê û heta pêncan dom di-

Pêveçûna mîletan bi zanîn û hinermendiyê çedibe; û wezfa rojnaman di kar û pêveçûna nijarden de, gelek mezin e. Heke sîbe, tîrk ji, mina Suriye an Libnanê pêveçûn, bigazabûn û bi qeydeyên demokrasi emel kirin; bî şîk çar mîlyon kurden Tîrkyayê ji, kovar û rojnameyên xwe derfinin û çavê me, bi xwendina wan jî ges bîbe.

ke. Dirêjahiya pîlén: 42 métir û 37 semîmetir; pîlén kurt.

### Radyoa Kurdistanê:

Li ser pîlén kurt diwesine; dirêjahiya di wan; 42 û heta 44 û nîv métiran; berî nîro li saet 11 û 45 deqîqan de, dest pê dike; û nîv saet, dom dike.

### Radyoa Azîrbacanê:

Hero pişî nîro der saet pêcan, li ser pîlén direj bi kurdi diwesine. Pîlén direj: 1410 û heta 1415 métiran. Ji van pê ve hin radyo-yên dînyayê stranên kurdi diwesine; mina yên Moskowa, Erivan Paris û Londre.